

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (147) Sal 25 01ê Berçille 2020 z - 2632 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# Çand û Gotara Lihevkirinê



## Desteya sernivîser

Hêjayî gotinê ye ku kiryar û tewanên dewleta Turkiyê û çeteyên wê li deverên Kurdî yên dagirkirî têne kirin, ew di asta jînosîd û tewanên şer de ne! Guhertina demografî li wan navçeyan aşkere mîna roniya tavê birêve diçe. Ji bo armanca rakirina Kurdan û çandina Ereb û Turkumenan di gund û bajarên wan de, kuştin, dizî, girtin û şewitandina dar û beran ji karên wan ên rojane ye, bê ku ev dewletên mezin, xwediyên duruşmên mafên mirov li hemberî vê hovîtiya kesndî karekî bikin!.

Belê…Di rewşeke wiha zor û tarî de ku tu rêz û rûmet ji mirov û .....

2

# Dadgehê ji ber navê Dêrsimê, rê neda ku komeleyek bê vekirin*



Yek ji damezîrênerên wê komeleyê jî dibêje, «em li hember biryara dadgehê matmayî mane» û herwiha amaje bi Komkujiya Dêrsimê dike û dibêje, «Di Komkujiya Dêrsimê de ji gundekî tenê kesek rizgar bû, ez jî kurê wî me». Li bajarê Dêrsimê yê Bakurê Kurdistanê, Komeleyeke Dîrokî û Çandî xwest navê xwe bi awayekî fermî tomar bike, lê ji ber hebûna peyva Dêrsimê di navê wê komeleyê de, dadgehê rê neda ku komele bê vekirin. Komeleya Dîrok û Çanda Dêrsimê ji bo fermîkirina xwe .....

7

# Mandina «ENKS» di Kiwalisyonê de û li Turkiyê rûreşiyeke dîrokî ye

**Memê Alan**

Em tev zanin ku, Kiwalisyona Sûrî - Ixwanî sîwana siyasî ji milîseyên Isalamî yên cîhadîst û terorîst re ye, di hembêza Turkiyê de ye û nandoziyê jêre dike (Turkiya ku, xaka Sûriyê û herêmên Kurdî dagîrkirî û balafir û top û tifingên wê bi hezaran keç û lawên me kuştine, şerê nasnama me ya Kurdî dike, ala Turkiyê li şûn a Sûriyê li herêmên dagîrkirî hildide, perê Turkiyê jî bi kar tîne, zimanê Turkî di dibîstanan de dide fêrkirin û ya Kurdî qedexe dike, bi alîkariya milîseyan guhertina demografî çêdike, nahêle xelkê me vegere ser cî û warên wan,.. Û HWD). Tê wê wateyê ku ENKS jî, nûnertiya wan dike, û di hembêza dewleta Turk ya dagîrker û kujer de ye.

Û ji ber ku, ew milîseyên Islamî yên tundrew (ên ku, Kiwalisyon nûnertiya wan dike), di bin serpereştiya istîxbaratên Dewleta Turkiyê û sîwana Kiwalusyonê de, hemî binpêkirin, kiryarên qirêj û tewanan (kuştin, îdamkirin, girtin, lêdan, işkencekirin, koçberkirin, zîndankirin, standina bace û vêrgiyan, revandina hemwelatiyan, destdirêjiya namûsê, qutkirin û hilkirin û şewtandina dar û beran, dizînên rengereng, guhertina demografî di gel dewleta Turk a dagîrker, teqînan,... Û HWD) di dermafê xelkê me yê Kurd ên resen de, li Efrîn û Serê Kaniyê de pêk tînin.



«Hevdîtina nûnerên ENKS bi Çawîş Oxlo re li Istenbûlê»

Hebûna ENKS di Kiwalisyonê de û li Turkiyê, wê pêş gelê Kurd, ji ber wan kiryarên qirêj ve, dixe ber berpirsiyariyeke mezin û dîrokî. Wêlomê, em dibêjin: Mandina ENKS di Kiwalisyonê de û li hundir Turkiyê rûreşiyeke dîrokî ye, divê ji bo berjewendiya xwe û gelê xwe, îro berî siba ji wê vekişê, ji Turkiyê derkeve, û vegere nav refê Tevgera Kurdî, û herêmên xwe yên Kurdî û Sûriyê ji xwe re bike meydana xebatê.

# Li Sûdanê, Kurê Kobanê Ismaîl Fewzî Resûl di bûyerek trafîkê de Jiyana xwe ji dest da



Roja Sêşembê 10ê Çiriya Paşîna 2020an, di bûyereke trafêkê ya xembar de, li dewleta Sûdanê, hevalê Ismaîl Fewzî Resûl (41sal) jiyana xwe ji dest da.

Li roja 15ê Çiriya Paşîn, bi beşdariya cemawerekî mezin ji dost, heval û hêzên siyasî, li goristana gundê Merc Ismaîl cendekî wî yê ku bi ala rengîn hatibû pêçan, hate veşartin.

Hevalê Mislim Şêx Hesen/Endamê Komîta rêzanî ya PYDKS, gotinek ji beşdaran re pêşkêş kir, li ser sincî û xebata gorbihuşt û rewşa siyasî axivî.

***Serê malbat, meriv û Rêxistina Kobanê ya PYDKS û gelê Kurd xweş be!***

**Çand û Got ... Dûmahîk**

nirxên mirovatiyê, çand û gotara mafên mirov û aştiyê re nema ye, gelo çi ji me Kurdan tê xwestin?! Gelo rewşa me ya îro rewşeke xweristî ye ku evqas bêrêzî li me dibe, bi ser de jî em hevdu napejirînin, şerê hev dikin û xweliyê li serê neyarên xwe dikin!

Bi kurtî dixwazin bêjin ku îde ev dem, ne dema piştguhkirina rastiyan, û bez li pey berjewendiyên partiyetî û kesayetî yên piçûk e, divê ji bîr nebe ku xwîn û paşeroja gelê me di stoyê berpirsên siyasî de ye, û bêgomane dê rojeke were ku ewê ji ber hilwestên xwe bêne pirskirin û darizandin, û hilwesta her aliyekî, her kesekî, li nik gel û dîrokê nivîskî belgekirî ye!

Digel hemû toz û dûmanê û heyama têkilhev, digel cudahiya nerîn û baweriyan, berjewendiya gelê me diyar û aşkere ye, ew di weşandina çand û gotara lihevkirinê, hevgirtin û yekrêziya hêzên wî yên sereke de ye.

Bi hêvî ne ku di vê serdema siyasî ya nû de, ji bo berjewendiyên xelkê, em gelê xwe nekin ardiwê tenûran!

# Kurdistana sor

Mislim Ş.Hesen



Berî ku bi ferahî rawestandin li ser Kurdistana sor bibe, tê xwestin ku ew guhartinên bingehîn yên li deverên Kurdistana sor rûdayî werin xuyakirin.

Vêca gelek şareza û dîroknasên misilman li ser vê mijarê û wan deverên Kurdistanê nivîsandine û dane xuyakirin ku ji sedsala dehemîn de, Kurd li Azerbaycan, Ermenistan û Haranê hebûne. Û herweha dibêjin ku kurê Şedad an Bin Şedad yê kurd li Haranê ji salên /951 ê-952 an/ û /1075 an -1076 an/zayînî de gelek Îmarat damezirandin û seroketî ji wan re kir.

Di heman mijarê de Profesor Cemal Nebez dibêje ku Babîk Alxuremî serhildanek mezin li dirêjiya bîst salan di salên /200 /koçî li dijî El Qeyser Rûsî Eliskender lidar xist, û dibêje ew serhildan dûmahîka serhiladana Ebî Mislim El xuresanî bû,çimkî dibêje Babîk Alxuremî ji neviyên Ebî Mislim El xuresanî yê kurd bû.

Lewra jî xuya dike ji van agahdariyên dîrokî ku beşek piçûk a Kurdistanê ji salên / 900 î-950 î / zayînî ve di nav axa Rûsya El Qeyserî de bûye, lê di sedsalên di pişt re, guhertinên dîrokî çêbûn û bandor li rewşa Kurdên wê deverê kir. Di vê babetê de nivîskarê Kurd Emîn Evdal gotiye ku êlên kurd di sala /1595 an de ji ber zilm û stema Osmanî û Farisan koçberî Qerebax û Larsîn bûne û ev her du herêm di nav sînorê Azerbaycana Sovyeta berê de bûne.

Di sala 1734 an z. De Nader Şah El-Farisî bi artêşeke mezin çû Qefqasyayê û Tiflîsê dagir kirin, û di nav rêzên artêşa wî de/ 6000 / şervanên Kurd jî hebûn.

Piştî rûdan şerê Rûsî-Êranî di salên / 1804 an -1813 an /z. de, Peymana Golestan di 101813/12/ an de di navbera her du welatan de hate encamdan, û hin herêmên Kurd bi serweriya Rûsya ve hatin girêdan, û navê Kurdistan li wê deverê hate kirin, lê Rûsya ji peymana Gulîstan ne razî bû, lewra jî şer vejandin.

Di salên /1826 an-1828 an /z. de, û di Sibat 1828 an de Şahê Êranî neçar kirin ku bi navê «Turkman cayê « peymanek aştî bi Rûsya re îmze bike, û li gorî peymanê du herêm radestî Rûsya kirin (Rawan, Nexcşûvan(.

Ji aliyakî dî ve, di salên /1877 an-1878 an / z de şerek di navbera Rûsya - Osmanî de rûda, û ew şer di Avdara 1878 an de hat rawestandin, li gorî peymana»San Stefano» û li gorî xalên peymanê ev dever Ardhan, Batum, Alaşkurd û Bayazîd ketin nav sînorê dewleta Rûsya, û her weha hin deverên rojhilatê Tirkiyê wek «Kotar» bi serweriya dewleta Êranî ve hatin girêdan.

Lê Brîtanya razî nebû û Rûsya neçar kir ku hin deverên weke Bayezîd û Alaşkurd vegerandin nav sînorê dewleta Tirkiyê.

Lewra jî rojhilatnasê navdar ê Rûsî Mînorskî ev agahiyên dîrokî yên borî pişt rastkirin. ji ber vê yekê jî ew dibêje, Kurd û axa Kurdan sînorên me yên Rûsî derbas kirin û ketin Qafqasiya. Herweha profesorek Sovyetî yê din jî li ser Kurdên Rûsya nivîsî û tekez dike ku Kurd di şerê Rûsî-Farisî yê salên /1804 an - 1813 an / û /1826 an-1828 an / zayînî û herweha di şerê Rûsî-Tirkî yê /1877 an -1878 an/ zayînî, ew ketin nav sînorên dewleta Rûsya û herweha dibêje ku beşek jî di şerê cîhanê yê yekemîn de koçber bûn ji Kurdistana Tirkiyê ber bi Rûsyayê ve reviyan.

Vêca baş hate xuyakirin ku beşek ji Kurdistanê bi Rûsya û Sovyetên berê ve hatiye girêdan,wê lomê jî Kurd di şerên Rûsî-Tirkî û Rûsî-Êranî de ligel Rûsyayê bûn û helwesta Kurdan li hember Rûsya her gav erênî bû, û wan alîkariya artêşê Rûsî li dijî dewletên Osmanî û Farisî dikir,û di vê mijarê de beşek mezin ji Kurdên «Ardalan» ên Êranî red kir ku biçin şer digel Êranê dijî Rûsya, ji ber ku Kurdan bawer dikirin jiyana wan di bin serweriya Rûsya de wê çêtir be.

Ji ber wê jî Rûsyayê pir girîngî da berjewendiyên xwe bi Kurdan re, û bi taybet dema ku agahdar bûn ku Kurd û Ermenî li dijî Empiretoriya Osmanî radibin û hin welatparêzên kurd wekî Şerîf Başa, Abdul Rezaq Bedirxan, Ihsan Nûrî Başa êdî guh nadin rayedarên Tirk, lewra jî têkilî bi Şêx Obidulah re danîn û piştgirî û alîkarî ji Abdul Rezaq Bedirxan xwestin.

Li beramberî piştgirî û alîkariya ku kurd pêşkêşkin, Rûsya soz da Kurdan ku ew ê otonomî bidin wan.

Lê piştî demeke kurt şoreşa oktoberê di 1917 an de li Rûsyayê dest pê kir û serfiraz bû, lewra jî Rûsya ji hemî aliyan ve hat guhertin û derbasî qonaxeke nû bû .vêca li gorî rewş û rêbazên nû gelek neteweyên di nav sînorên dewleta Rûsya de azadiya xweya neteweyî stendin û komarên Sovyetê hatin damezrandin, û her weha li ber ronahiya siyaseta nû ya Yekîtîya Sovyetê, Veledemîr Êlitiş Lenîn di sala 1923 an de biryar da .....

4

**Kurdistana ... Dûmahîk**

ku otonomî bide Kurdan li Kurdistana Sor, ya ku di çarçewa Komara Azerbaycanê de dimîne, û di heman salê de Lenîn birûskek ji Serok Komarê Azerbaycanê, Nariman Narimanov re şand û got, «Rewşa gelê Kurdistanê pir dijwar e û Kurdên li wir birçî ne, dibe hûn alîkariya wan bikin.

Di wê demê de, nifûsa û hejmara Kurdan li Kurdistana sor di navberî /3540-/ hezarî deye û rûbarê xwe /35340/km.

Bo biciânîna biryara Lenîn, Parlamentoya Azerbaycanê biryar stand ku şeş herêmên Kurdistanî yên li Azerbaycanê bi heva girêde «Qereh Qişlan, Gulbajar, Kotolê, Kobatlî, Kurdgaris, Morad Xanliyê» ev herêm ji Qeradax dest pê dike heya digihêje Çemê Aras û bajarên sereke yên wê herêmê «Lajîn, Şoşe û Naxişwan» in.

Li gorî biryara perlemanto kurdisatana sor hat ragehandin û bajarê Şoşe destpêkê kirin paytext, lê piştî demekê hat guhartin û lajîn kirin




paytext, û Xosê haciyêv bû serokê yekem.

Li destpêkê, gelê Kurd li Kurdistana Sor di warê çand û zanistê de gelek gavên erênî avêtin. Dibistanên Kurdî li ser asta sê qonaxan vekirin, û gelek pirtûkên zanistî û çandî bi zimanê Kurdî çap kirin, û her weha Rojnameyek bi navê «Kurdistana Sovyet» jî bi zimanê Kurdî hate çap kirin, û radyo dest bi weşana Kurdî kir.

Lê mixabin piştî mirina Veledemîr Êlitiş Lenîn di Sala 1924 an de siyasetek nijadperest û kirêt li dijî Kurd û Kurdistana Sor hate şopandin, û hêdî - hêdî dibistan hatin girtin û her weha li gorî biryarên nijadperest û şovenîst hemû sazî û dezgehên Kurdistana sor hilweşandin, û Komara Azerbaycanê dest bi koçkirina Kurdan kir, û ta gîha ku Kurdan êdî newêribû bi zimanê xwe biaxifin û li kurdeyetiya xwe xwedî derkevin!

Divê warî de, Dr. Kendal Nazan di lêkolîna xwe de dibêje ku heya salên sîhî dor /50/ gund û bajarên Kurdan di nav sînorê Azerbaycanê de hebûn û hejmara Kurdan li wan deveran nêzîkî /42/ hezar kes hebûn.

Vêca ew siyaseta nejadperest a li dijî kurdan û di bin çavdêriya serok komarê Azerbaycanê Mîr Jafar Baqerov de berdewam kir, û di sala 1927 an de, ji Naxşivan, Lajîn û Qerebaxê kurd ber bi Asyaya Navîn, Sîbîrya, Tacîkistan, Ozbekistan, Qirgizistan û Kazakistanê ve bi deh hezaran bi riya Tirimbêlin ajilan koçber kirin, û li ser vê yekê Akademîsyan Nader Naderov dibêje, «Di navbera salên /1937 an -1953 an/ û di serdema Stalîn de, kesî newêribû behsa ew kiryarên kirêt û neheqiyê ku Kurd rastî hatî bikirana.

Lê dema ku Xrûşov bû serokê Yekitiya Sovyetê, delegeyên Kurdistana Sor serdana wî kirin û jê xwestin ku ew vegerin cihên xwe û carek din Komara Otonomî ava bikin, lê mixabin, serokê nû ew daxwaza Kurdan paşguh kir , ta Yekîtiya Sovyetê di 1992 an de hilweşiya, lê piştî hilweşandina Sovyetê cardîn di 1992 an de komara Kurdî ya LAJÎN di bin serokatiya Wekîl Mostafayev de hate damezrandin, lê ji ber ku piştgiriya giştî ya Kurdan jê re nebû, dirêj nekir, çimkî li gorî siyaseta Ermenî ya dijminahiya Azerbaycan bû, û ji aliyê din ve Kurdên ku bi Azerî re ol, çand û ax parve dikin hate red kirin, û serokê wê (Mostafayev) wekî penaberê siyasî çû Îtalya û di 192019/4/ an li paytexta Balçîka biroksêl çû ser dilovaniya xwe û li ser daxwaza wî li herêma Kurdistana Îraqê bi axê hat hilpesartin .

## Li Qamişlo, Heval Hisên Îsa koça dawî kir

Di encama nexweşiyê de, roja Duşembê 14.09.2020, dilê hevalê Hisên Elî Îsa rawestiya. Sala 1967an, li gundê Xirabê Reş ji dayik bûye, bavê pênc xort û qîzekê ye, ku wî ew bi xwêdana eniya xwe dane xwendin û ji zanîngehê derçûne.

Ji salên 1990an ve tevlî rêzên partiyê bûye. Ji ber sedemine wî yên taybet, çend salan ji karê rêxistinî bidûr ketiye, ji sala 2003an û virde, ta dawiya jiyana xwe, di nav rêzên Partiyê de, li kêleka hevalên xwe, kar û xebat kiriye.

Bi beşdariya birek ji dost, heval, meriv û hezkiriyên wî, ew di goristana Mehmeqiyê de li axê hate sipartin. Hevalê Mihemed Salih/Endamê Komîta birêvebira Partiyê, li ser xebat û kurtejiyana gorbihuşt axivî.

***Cihê te bihuşta berîn be hevalê Hisên, xebatkarên mîna te nayên jibîrkirin, sere malbat, hevl û hogirên te xweş be!***



# Rojên Tarî

## Zanistî comî



Wek her dem û her roj ji destpeka êrişa dewlata Turkiyê tev hêzên tundrew li ser bajarê Efrînê û gundewarê wê, berê min û piraniyê şêniyê me yên çiyayê kurmênc li Efrîn bûn. Nizam ji ber tirsê bû, lê nizam wiha dihat xwastin. Gundî û bi teybat kesên nêzîkî sînor ji zû ve berê xwe dabûn bajarê Efrînê, ew ji ber top û balefiran direvîn. Hin bi rê de û jî di gund de dihatin kuştin, û yên birîndar radikirin nexweşxana Efrînê ji ber ku nexweşxane li gund û bajarokên sînor tune bûn. Piraniyên gundiyên sînor bi cilên xwe ji malên xwe derketin bê ku, kanibin tiştên xwe yên pêwîst birevînin, hemiyan li torumbîl û derktoran siwar dibûn diçûn bajarê Efrînê ba mervên xwe, û piraniya digotin: Çend roj an çend hefteyan emê li mal û gundên xwe vegerin.

Qasnaq li serê Efrîniyan teng dibû, bombe û balefir pirtir dibûn di (40) rojî de deslata Turkiyê tev hêzên tundrew nikanibû pêşde bihatana û tu gund bi temamî kintirol nekiribûn, lê şêniyê gundên sînor direvîn û li hin devran li ser xwediyê malan dibûn bargiranî. Hevalên di şer de mîna lehengan ber xwe didan û tirs dikirin dilên neyaran, lê mala balefir, tang û topan bişewite hêdî -hêdî pêşde dihatin, kesên sêvîl dihatin kuştin, gund wêran dibûn, dar û çiya dihatin şewitandin, li pêş cîhanê û rêxistinên mirovane tev ker û lal diman! Di qonaqa diwem de, gundên diketin dest Tirkan pevçûn tê de kêm dibû û şer kêmtir dibû, gundiyan dixwastin vegerin gundên xwe lê mixwabin hevalan digotin: (Heval qedexe ye) ma çêdibe tu herî ba dijminan bi rastî dibûn kelem li pêş kesên dixwastin vegerin gundên xwe wek çawa bûne kelem, gava xelkê dixwast ji e

Efrîn bireve û berê xwe bidin Heleb an gundên şêrewan yan deverên din. Ew dîmen wek lehîyê tê bîra tevan bi çi zehmetiyê û tirsê xelkê Efrînê derdiketin nema dizanin ku va diçin. Efrîn dihat dorpêçkirin hinan di turmpîlan de xew dikirin ku, derfet di wan keve ku birevin. Di deh de rojên dawî de tevan nizanî bûn wê çi bikin, ta hevalên rêvebir û çi yên ji rêvebiriya xweser ve nêzîk tev winda bûn nikanîn tu biryar bistandana ta ku, berê xelkê bidin gundan an derveyî Efrînê, vêca wek pezê bê şivan mabûn û her yekî li gor zanîn û hebûna xwe biryara distan. Ev rewşa teng û dijwar bi giranî di ser miletê Efrinê re derbas bûn di hundir her malekê ji kurdaxê de, bi deh çêrokan vêre derbas bûbûn. Tunebûn, birîndar de nexwaşek an kuştîk li pêş çavan windakirin, tirs û... h.w.d

Hinan ji me digotin: Veger derman e lê mixabin bi xwe venegerî, bes bang dikir veger derman e. şûnê bav û kala çênabe vale bimîne ji ber ku dema vala bimîne wê bibe ciyê çeql û roviyan. Vêca me xwestî yan nexwestî û em razî yan ne razî, bi awakî ne hişmend û aqildar tevgera kurdî yek ji sedemên alîkariyê ye ku, Efrîn û gundewarên wê ji Kurdan vala bikin û guhartina demuxrafî bi hesanî cicîbibe. Piştî têkçûna Efrînê dîsa hevalan nedixwast û ne jî hêştin ku, efrînî li gundên xwe vegerin, rêbend li gundê Bênê çikiribûn bi bîra we tevan tê. Bilî wê tevgera kurdî bi du rêbazan dihat nas kirn û ev yeka ne veşartîbû, yek ji aliya dixweze Y.P. G û Y.P.J têk biçe û bila bêder bisewite ne xem e û kevir li ser kêvir namîne hema bila ew li şûna wan rûnin û xwe venin, û aliyê din dixwazin û li gor zanîna xwe ber xwe bidin û di şerê xwe de biserkevin bê ku bi kes an aliyên din bişêwrin ji bilî xwe kesî nabînin, lê mixwabin dîsa bêder tev şewitandin bê ku guh bidin dedora xwe û hîn dûmanê reş radibe !

# Hevalê Qasim Ehmed (Bavê Firas), çû ber dilovaniya Xwedê



Li Kobanê, piştî berxwedanê bi êşa pençeşêrê re, îro Çarşembê 18.11.2020, heval Qasimê Ehmed çû ber dilovaniya Xwedê. Hêjayî gotinê ye ku ji bo doza Kurdî ya dadmend, wî 35 salan ji temenê xwe, bê dudilî kar û xebat kiriye, û gorbihuşt endamê Komîta Herêmê ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê bû.

***Bila serê malbat, meriv û hevalên Rêxistina Kobanê û gelê Kurd xweş be.***

# Dr. Nurî Dêrsimî... Jînenîgarî /Biography

Beşê yekemîn

**Ibrehîm Şitlo**



Qehremanê Şoreşa Dêrsim Dr. Nûrî Dêrsimî bi qewîtiya Serdariya Berxwedana Dêrsim piştî Êrişa hovane yên Çekdarên Dewleta Tirkiyê li ser Dêrsimê ji Herêmê derket û xwe gihand Devera Iskenderûn.

Di Sala 1938 de binehênî darbasî Bajarê Helebê bû û dora Salekê bi nehênî li nav Civata Ermeniyan dijî. Di dawiya Sala 1939 de bi alîkariya Mezinê Kenîsa Ermenan bi fermi li gora Peymana ku Iskenderûn kirin para Dewleta Tirk, Dr. me nemir bû Welatiyê Dewleta Sûryê.

Piştî Salekê Hukûmeta wê Demê (Fransa weke ji aliyê Civata Milletan bûbû Berpirsyarê Sûryê) Karê Doktorê Veterînêrî li Bajarê Ezazê pê hilpesart.

Lê çawa Hukumeta Tirkiyê pê agahdar bû ku Qehremanê Dêrsimê li Sûryê dijî û Şopa wî li Ezazê bicih kir, bi awakî Fermî ji Dewleta Fransa xwest ku Dr. Nûrî Dêrsimî bide destê Tirkiyê ji ber ku ew li gora Tirkiyê ew hîna Welatiyê Tirkiyê ye û li wir bi Tawanbariya Dadgeha wir Biryara bidarxistinê dijî wî hebû û weke Gunehkarikî Bazdayî bi nav dikir.

Lê Hukûmeta Fransa xwesteka Tirkiyê bi cih ne anîn. Dema Dewleta Tirkiyê bê Çare ma û Hêviya wê bi girtina Dr. Nemir birrî, ica bi Rêya Diplotatîkê Tirkiyê ji Serdariya Fransa re got: «Hebûna wî li nêzîkî Sînorê Tirkyê ji Dewleta Tirkiyê re Aloziyek mezine» ü ji Hukûmeta Fransa xwest ku Cihê Dr. ji Ezazê biguhêre û dûrî ji Sînorê Tirkiyê be. Ica, Cihê Karê Dr. ji Ezazê rakirin û Karê Vitirinêrî li başûrî Sûriyê - Bajarê Swêde bû û dûvre şandin Qudis - Felestînê. Li wir Hevalê wî yên Tevgera Xoybûn Karê Pêwendiya Derve pê sipartin. Li Felestînê li gel mezinên Felestîn Pirsgirêka Kurd da nasîn û herwiha jî li gel Tevgerên Juhû jî Pêwendî kir.Piştî Cenga Felestînê – Cuhû pêkhat, Cihê Karê wî ji wir hate Bajarê Helebê û ji wê Demê de ta Koçberiya wî di Tabaxa 1973 yan li wir ma.


Ta Sala 1962 Mala wî li Kolana: Îsmeîliyê- Cada Ehmed Şewqî - Avahiya Gozim bû. Piştre barkir Kolana Mehetet Baxdad – Ew Qat ji Ewqafê Kirî. Dr, Nûrî Dêrsimî di Salê 19611962/ bi Nexweşiya Dil ket.Apê Têkoşer û Welatparêz sedema nasaxiya Dilê xwe ji min re wilo got: Rojekê Dr. Nureddîn Zaza telefûnek ji min re ji Bêrûte vekir û gote min: « Xortekî Kurd Dêrsimî wê were Ba te, tu baweriya xwe pê bike».

(Dr. Nurî Dêrsimî baweriya xwe heta dawiya Jiyana xwe gelek bi Dilsoziya Dr. Nureddîn Zaza hebû, jê hezdikir û baweriya xwe pê dikir. Ew li bawî Kurdekî Welatparêz,Xebatker û Dilsoz bû).

Piştî Telefûna Dr. Nureddîn bi 2 Rojan, Yekî li Derî da, min ew Peyayê ku Nureddîn ji min re rêkiriye li pêş xwe dît. Piştî Bixêrhatinê, wî navê xwe ji min re got û xwe ji min re weke Kesekî Dêrsimî pêşkiş kir û Navê Gundê min, Mala me,Êl û Eşîra me, navê Gundiyan û Malbata Bavê min, hemû Bûyerên ku li Dêrsimê û çend Kes jê xweş mane ji min re Şîrove kirin. Biser wê de jî ji min re navê Keça min Delal got û wî wilo her Tiştek kûr û hûr bi temamî digot ku min û Xaltîka te jê bawer kir û hîna jî ji ber ku ew bi Rêya Dr. Nureddîn hatiye ica baweriya me bi Gotinên wî bê Goman bû. Wî çi ji mer re digot me jê bawer dikir.

Ji min re got ku Keça min Delal hîna jî dijî û gelek hûr û kûr ji min re pêjirand ku Dilê min pê hat girêdan.

Wî wilo xwe xist Dilê min û Xaltîka te ku me ew weke Mîvanekî pir giranbuha didît ta ku me Oda xwe yê ku em lê dirazin jêre hîşt. Lawê min, min bi destê xwe Xwarin jêre datanî.



Lê, wî gote min: ku ew dixwaze Tevgerekî Şoreşgêrî Kurdistanî pêkbînê û Xebatek xurt bike. Ewî dixwest Tola Dêrsimiyan ji Tirkiye bibe. Wî Pîlana xwe wilo her tiştek bi Zelalî û germî Şîrove dikir ku min jî Pêşneyarê wî bi rêzkirina Xebatek Niştmanî qayîl bûm û ji bo Sazkirina Tevegerekî Kurdî Şoreçgêr min û Xaltika te Zêrê xwe firotin û çi Perê me hebûn û hîna jî Deyn kirin me jêre amade kirin û berî ku ew ji ba me birêkeve Xaltîka te hinek ji Peran jêre di nav Çakêt û Cilên wî dirûtin û bi hembêz û germî oxirkir. Min jê xwest ku çawa ew bi xweşî bê Alozî bigihê Tirkiyê min bi awakî agahdar bike ta Dilê min û Xaltîka te xweş be.

Piştî Heftîkê Kertek ji min re bi Postê hat. Ew Kerta Postê Fotografê Bajarê Iskenderûnê liser bû, pêşî Dilê min xweş bû ku Mîvanê min Hêja bi serfirazî ji Sûryê derbas bûye. Lê wî wilo nivîsandibû:

«Ez bi Karê Kuştina te hatibûm Mala .....

## RABIN JI XEW

**Ehmed Tahir**

**Li welat dû û dûman e**
**Gih kuştin e, gih talan e**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Xwelî li serê nezan e**
**Besin ev rev û koçberî**
**Besin kul û qehr û girî**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Ta kengî kîn û rikberî**
**Keç û xortên me dikujin**
**Xwîn û keda me dimijin**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Destan bidin hev, mêr û jin**
**Ji dozê re bibin mirîd**
**Ey kurdên hişmend û egîd**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Mîna Qazî û Şêx Se,îd**
**Bibin xwedî hêz û biryar**
**Êrîşkin dijmin û neyar**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Derdora me dûpişk û mar**
**Pişta hev bigrin bernedin**
**Bese nezan û kolebin**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Hemî zîrek û xwende bin**
**Bibin balyoz û rewşenbîr**
**Bibin bira têr û feqîr**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Besin ev hêvî û sawîr**
**Windakirintac û eywan**
**Jibîrkirin zar û ziman**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Jiyan nabe bê berxwedan**
**Rê nedin tolaz û begler e**
**Tiştekî nakin ji we re**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Pênûsê têxin senger e**
**Besin xemsar û nezanî**
**Xwedî welat û zimanî**
**Rabin ji xew, gelî kurdan**
**Tiştek nayê bi hesanî.**

---

**Dadgehê ji ... Dûmahîk**

serî li dadgeha Dêrsimê da, lê dadgehê ew serlêdan qebûl ne kir.Di heman demê de bernameya komeleyê jî ku lêkolînkirina çanda Elewîtiyê, bûyerên komkujiya Dêrsimê û arşîvkirina wan li xwe digre, weke çalakiyên cudaxwaz binav kiriye. Wê komeleyê jî li hemberî vê biryara dadgehê nerazîbûna xwe nîşan da û got, tenê ji ber peyva Dêrsimê dijayetiya wan tê kirin û dadgehê rê nedaye wan ku komeleya xwe vekin. Xidir Çîçek, yek ji damezrînerê Komeleya Çand û Dîrokê ya Dêrsimê beşdarî bultena Rûdawê bû û behsa helwesta li hember komeleya wan kir.

Xidir Çîçek di axaftina xwe de amaje bi komkujiya Dêrsimê kir û got, «Ez jî ji malbateke mexdûr im. Di 193738-an de em rastî komkujiyeke mezin hatin. Ji gundekî ku 15 mal tê de bûn, yek kes rizgar bû û ez jî kurê wî kesî me». Li ser sedem û armancên damezirandina komeleyê jî Xidir Çîçek dibêje, «Pêwîstiyek hebû, li ser Dêrsimê ti amarên dîrokî nehatine tomarkirin. Ji bo parastin û veguhastina çand, klam, dengbêjî, rûtuelên dînî yên Dêrsimê me ev komele damezirand». Çîçek li ser biryara dadgehê jî dibêje, «Gotin divê navê Dêrsimê bi fermî neyê bikaranîn. Em li hemberî biryara dadgehê matmayî mane. Ji ber ku Dêrsim navê dibistanekê jî ye. Navê Dêrsimê bi hezaran sal e tê bikaranîn». Derbarê hewlên wan ji bo vekirina wê komeleyê jî Çîçek dibêje, «Me bawer nedikir dadgeh navê Dêrsimê qedexe bike. Em dê biçin dadgeha bilind». Roja 4ê Gulana 1937ê komkujiya Dêrsimê hat kirin, 13 hezar Kurd li Dêrsimê hatin kuştin, 12 hezar bi neçarî hatin koçberkirin. Seyîd Riza û hevalên wî 5ê Gulana heman salê hatin darvekirin.

Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan roja 23ê Mijdara 2011ê ku wê demê serokwezîr bû, çend belgeyên dîrokî derbarê komkujiya Dêrsimê de pêşan dan û siyaseta wê demê ya dewleta Tirkiyê rexne kir.Herwiha derbarê komkujiya Dêrsimê de got:

«Eger pêwîst bike bi navê dewletê daxwaza lêborînê bê kirin û nerîteke wiha hebe, min daxwaza lêborînê kir û daxwaza lêborînê dikim. Ev bûyer di demekê de ye ku CHP take partiya desthilat bû. Lewra yê ku pêwîst e daxwaza lêborînê bike, Kemal Kiliçdaroglu ye.»

Salane 3ê Gulanê komkujiya Dêrsimê tê bibîranîn û gelek caran ev bîranîn di warê siyasî de nîqaşên cuda ligel xwe tîne. Dêrsim bajarekî Bakurê Kurdistanê ye û niha hejmara akinciyên wê derdora 86 hezar kes e. Li gor daneyên Saziya Amaran a Tirkiyê, 8 bajarok, 2 belde û 342 gund li sînorê parêzgeha Dêrsimê hene.

*Rudawa Kurmancî 26.11.2020an.*

---

**Dr. Nûrî ... Dûmahîk**

te, lê gelek caran ku min destpêdikir ku te bikujim lê dema Çavên min li Destê te yê dilerzîn te Xwarin û Vexwarin ji min re datanîn Destê min ranedibûn ku ez Karê pê hatime bicih bînim.»

Piştî Apê Nemir Gotinên xwe bi kul û Keser bi Dawî kirin, min jê pirsî dawî te Tiştek jî bihîst an Dr. Nureddîn Zaza negot ewî çawa Naskir, Apê Nemir Bersiva min wilo da:

Weke Dr. Nureddîn ji min re got, ku ew ji aliyê hinek Kurdê Welatparêz hatibû ba wî Bêrûtê.

Navê wî Hesen Boluş bû, ew piştî çûbû Tirkiyê, MÎT ew xistibûn Zindanê nav Welatparêzên Kurd, lê wan zû naskrin ku ew Nokerê MÎTe, hema wan dixwestin wî di Zindanê de bikujin, lê ji wir MÎT ew derxistin û şandin Swêdê nav Kurdan, lê li wir Şopa wî wenda bû.

Dr. Dêrsimî, Peyakî Bejn ne Bilind û ne kinbû, Comerd û Xwedî Vîn û Kerisme bû. Kesayetîkî bi Şewqa Dîrokî bû.

Bîr û Baweriya xwe Kurd û Kurdistan bû,tucarî gotina Olî, an Pirsa Olî ji Mîvan û Kesên Serdana wî dikirin ne dipirsî. Derd û Xema wî serkeftina Kurdistanê bû. Jiyana wî her Kurdayetî bû û Armanca wî her rizgarkirina Kurdan bû.

Ew bû ku Gotina Netewî ji Mêvanên xwe re dûbare dikir:

«Sinnî, Elewî, Êzîdî çî? Em hemû Kurdin û mane Birçî!»

# Koronaname !!!




**Dr. Memo Abdî**

**Berêzan…**

**Xoşewîstan...**

**Nexweşên koronayê...**

Wek hûn jî dizanin, ev pandêmiya (coronavirus) ku li cîhanê belavbûye û sînor çirandine û derbasî hemî welatan bûye bê ku rêdanê bixwazê. Bûye cihê tirs, sawîr û matmayînê. Pir nexweşî mîna vêna bobelat û tiştê nebûyî bi serê mirovahiyê kirine, di pêvajoya afirandina jiyan û zayîna insan li ser rûyê vê zemînê de û gorî û qurbaniyên giran dane. Lê ciyawaziya vê nexweşiyê ji wan ên derbasbûyî çiye gelo!? Berî her tiştî ez jî wek Dr.Memo Abdî (Mihemed Alî Abdî ) bûm yek ji qurbaniyên vê nexweşiyê û ta êsta ez êş û azarê wê dikêşim, lê bi hêvî me ku ez hêdî hêdî xwe ji nav neperûşkên vî hovê dirinde rizgar dikim û ber bi peravên saxlemî û tendurustiyeke rasteqîn ve diçim. bi saya xwedê û berxwedana min a bêhempa li hember vî dijminê nedîtî û nebînayî di dîroka nexweşiyên pêvedanê de... ji lewre, ez tevî ku zanyarî û agahiyên baş li ba min hene li ser vê nexweşiyê bi fermanê ku ez jî bijîjkim, jê wêdetir min hemî azar û keftalefta ku ev virus çêdike jiyan kir û pêjn û pûnijên wê hestkirin, û ji nêz ve hingivîne nervîna û çarenûsa min a fîzîkî.

Ji xwe berî aniha min çend namên hişyarkirinê bi zimanê kurdî û erebî weşandin di riya alavên ragihandinê de (TV, êstgeh û rûpelên hevgihandina civakî de ) bi armanca sûd û mifa bê wergirtin ji hêla xelkên me ve, da ku xwe biparêzin û nexweş nekevin û di encamê de nebin alîkar di belavkirina wê de çi bi hemdê xwe be (tembelîtî) û çi bê hemdê xwe be. Vêca hawniştimanê min û delalê dilê min van şîret û rênimayên ku dixwazim destnîşanbikim pêwîste bi rijd û guhdaneke ji dil bipejrîne û tikadikim neyên paşguhxistin û cihê tinaz û pêkenkan bê.

1. Ev nexweşî zor hêsan û pêkan e ger tu hişyar bî jê re. Bi gotineke din, pêwîste tu şehreza be di naskirina berjeng û nîşanderên wê yên ku zû xwiyadikin de, mîna bilindbûna têhna laşê te jorî 38 an. Êşek şidehayî di zengelorê de. Êşên giştî di laşî de. Guhertina tamê devê te. Ya herî giring û metirsîdar kuxik û nefestengbûn e. Bê guman kêmxwarin û rewşa derûnî û sawîrên mîna kabûsan û tirsa mirinê ev hemî dibin para nexweşî û ji qerem û hêza xwe dikevê bê vîn û daxwaza xwe.

2. Giring e yek xwe şaş neke û riya xwe jî winda neke. Bi lez xwe bighîne bijîjkê pispor û hemî pişknînên pêwîst û lezgîn çebike bi armanca danasîna Coronavirus û dest bi çareseriyê bike bi şêweyekî lezgîn û bê dudilî xwe amade bike ji cenga bi vî hovî re, ya na. Her rojek derengketî wê ne di berjewendên tendurustiya te de be. Lê, berevajî wê, wê bibe alîkar ji Coronavirus re. Erê wisa ye û yê ku ne bi vê duruşmê nêzîk bûne ta aniha rewşa wan ewle û misoger nebûye û ketine bin biv û tehlûkê de lê mixabin. Me got ev virus çiqas hêsan û pêkan e, wisa jî kujerekî lezgîn e û melkemotekî bê wijdan e û rihstên e.

3. Kesé tûşî Coronavirus bûye û wê bibe, pêwîst e xwedî moralekî bilind be û derûneke ji pola bê, yan na, wê xwe radestî vî virus î bêdilovan bike û stuyê xwe bide ber kêra wî.

Îro bes e, tiştên ku ez negiham destnîşanbikim sebaret çareserkirin, xweparastin di xeleka duduyan de be.

Slav û rêz, bi hêviya jiyaneke bê Korona....

# Bihabûn ... Barekî giran e



**Nazdar Hesen**

**Bihabûn û peydakirina pariyê nên li ba welatiyên sûrî yên ev nêzî deh sal di cengeke herî qirêj de dijîn, bi taybet li vê dawiyê destpêkirina cenga bihabûn û xizaniyê û têkiliya bihaneya dolar bi jiyana wan ya rojan e, jiyana welatiyan kambaxtir û aloztir kiriye.**

**Ceng, top û cebelxane, ji bihabûn û birçîbûnê bi dilovantir û hêsantir e!…Tu dikarî xwe ji ceng û topan biparêzî, lê tu qet nikarî dengê zikê birçî rawestînî!…Dema top û agir dibarîn, rewş ji niha çêtir bû. Belê, di vê demê de, ev gotin a piraniya xelkên Sûrî yên belengaz û perîşan vedibêjin û li ser zar û zimanê wan digere. Ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin rewş û jiyana welatiyan roj ji rojê xirabtir dibe, rabûn û rûniştina wan jî bi rabûn û daketina dolar ve tê girêdan û di destên bazirganiyên çeng û kirîzan de dimîne.**

**Belê…kêmbûn û bihabûna hemî pêdiviyên jiyana rojane û pêwîstiyên wê, cengeke dîtir e, rewşa xelkê xirabtir dike û barê jiyanê li ser milên wan girantir dike, lê ne tenê wiha jî, ew bi xwe re pir kêşeyên civakî jî tine, û pêşeroja welêt tarî xuya dike. Ji ber vê yekê jî ger rewş wiha bidome û kirîz berdewam bibe, wê metirsî pirtir bibe û rêya çareseriyê wê dûr, dirêj û dijwartir bibe, û rewşa welatê me wê wek ya Efrîqiyan bibe, rojane bi sedan wê ji birçîbûn û nexweşiyan bimirin!**

# Serê te bi min re êşa?

**Melek Şêx Murad**

Di riya kurs ê zimanê Almanî re, li vê biyanistanê, min xortekî ciwan, tenik û bejin zirav, bîrwer û nazdar dinasî. Pêlên xemgîn û melûliyê her dem li ser rûyê wî bi balkêşî diyar dibûn! Vêca jî, wî bala min dikişand. Piştî çend rojan, min li rewş û halê wî diprsî û jê re digote: Kurê min, ligel ku tu di zimanê Almanî de ji me hemiyan zîrektir î jî; lê dîsan jî , şanên xegîniyê xwe li ser rûyê te diyar dikin û dilê mirov dêşînin !

Hîngê wî bi keserên kûr bersiva min weha dida û digot: Çêroka min dirêj e, ma ezê çi bêjim û çi jî nebêjim! Yên weke te, meta hêja, baş diz in ku, çima û çawa piraniyên kurdên me bi van welatan ketine. Armanc û merema min, ew e ku xwendina xwe bajome û bidawî bikim û di bera jî, pir pêwîst e, ku karibim karekî xwe peydabikim da ku, bi awakî alikariya dê û bavê xwe li welêt bikim! Wisan jî, di nava van armanc û dilxweziyên min de, êşa min a mezin, evîndara min ya ku me li welêt di Zanîngehê de ji hevdu hez dikir bû. me soz û peyman didan, sûnda giran di navbera me de ew bû, ku ji bilî mirinê tu kes nikare destên me ji hevdû bike !!.. Mixabin, çi û çiqas mixabin, di nava wa keftelefta şer û cenga li welêt û li ser welêt dibû û hê jî dibe de, em ji hevdû pir bi dûr diketin! Ew jî,evîndara min, ji berî salekê ligel xwediyan li vê welatê Almaniya cîwar dibû, me hevdû didît û wê ji min dixwest ku ez wê ji dê û bavê bixwezim, da ku em ligel hevdu alîkar bin û maleke xwe ava bikin û duhatiyeke xweş û geş bêlîbikin. Wisan jî, min serlêdanek ji xwediyên wê re çêdikir û daxweza xwe diyarî wan dikir, wan jî bi rûken û kêfxweşî pêşewaziya min dikirin û bavê wê weha ji min re digot: Kurê min, weke tu dizanî, keça min pir li ber dilê me nazdar û biha ye, û ji te ev yeka naye veşartin, ku vaye salek e em li vir in, xwezigênciyên keça me gelek in! Lê ji ber ku ew bi te raziye! Em li pêş vîn û daxweza wê ranawest in. Loman jî, ez barê te giran nakim û ew bar û temenê namûsê nîne! Lê hema ji bo nirixê keça min, daxwezên biçûk ji te hene, ew jî ne giran in!

Pêwîste tu bi heft hezar Euro zêran bikirî, dewat û qeleng jî wê hebe yanê bi kurtayî, dora panzdeh hezar Euro bi kêmanî ji te re gerek dibe! Perê te hene?!. Min bi şêtmayî li çavên dîlbera xwe dimeyzand, belkîm ew ji ber min ve karibe bersiva bavê xwe bide, û li ser min piçekê sivik bike, ji ber ku ew rewşa min baş dizane, û berê hînga li welêt, li ser tuştine wisan me li hevdu kiribû. Çi zor mixabin, wê bi rûkî ber kenî digote min: Bavê min pir mirovekî demiqras û hişmend e. Lewre jî, wî barê te qet giran nekir, ne wilo?! Min rewşa te berê jê re baş şirofe kiriye! Hîngê bi melûlî, dilekî şikestî û pir poşmam ji mala wan derdiketim!

Mixabin ji berî çend rojan min bihîst ku, dewata wê bû! Çiqas tehl e ku birek ji me kurdan -li vê biyanistanê- xwe şaş dikin û dane ser riya rûdawên beloq, pûc û vala. Ew serpêhatiyên curbecur, yên ku em îro meşexit û penaber bûne ji bîra kirine! Wisan jî pirsek tek û tenê xwe di serê min de hildide! Ma gelo çima keç û jinên me dirûşma wekheviyê ji hêlekê ve hildidin, û li hêla dinê jî, bazar, kirîn û firotanê li ser xwe dipejirînin?! Loman jî civak tev di çavên min de nizim, vala û pir pûç xuya dike!

Wî gotinên xwe bi keserên kûr dibirîn û diçû li benda bersiva min nedima! Disan li paş xwe dimeyzad û digot: Di serê min de, kurtepirsek bi hêz xwe lêdide! Ma gelo ta kengê em ê li ser şopa gerdîşên civakî yên pûç û vala ku ji sedê salan ve toz û kulxanê li ser pal vedane bimeşin , keç û jinên xwe di bin navnîşana qelengan de erzan û biçûk bikin û rojên li pêş, li serê



wan teng bikin?!. Ma gelo çend rengên kirîn û firotanê hene? Ev rûdawa qelengan, ne li gor bejin û bala keçên kurd e! Çiqas heyif û şerm e, ku em vê yekê li ser xwe bipejirînin! Ma kî nizane ku jina kurd ji roja roj ve, ew şervan e, xanima malê ye, dayîk e û pir caran weke dayîk û bav rola xwe di malê de cî girtî an na?

Jin nîvê civakê û perwerdekara nîvê dî ye, ev dirûşma li kû dimîne, ew galgal û peyvên qelew li ku dimînin! Meta hêja, li min bibore! Bi ya me be, jin civak ser û ber e, ma kî nizane navê jina kurd bi tîpên zêrîn di dîroka kevin û nû de hatiye nirxandin, ji ber ku ew weke her kes dizane li beramberî jiyanê li rex mêrê kurd û di barên giran de hevpişk û beşdar e, bê erê û na bi erk û rola xwe radibû. Îro jî, weke mînak û nimûne, nav û dengê wê bi balkêşî di gastîna Cîhanê de, weke sembola dilêrî û pêdariyê bi şahnazî xwe nîşan dide! Pêwîste mirov vê rastiyê nas bike û bi hawkî wê bipejirîne, nemaze keça kurd çi li der û çi li ....

10

# Agir

**Mihemed Qere Hesen**



Ji zagonên xwezayê ne ku zindewer li cihê sedemên jîn lê heye dijî. Sedemên sereke jî av û heyame, û cihê xwerin lê heye. Ji ber van sedeman çiyayê zagrosê û zincîra wî, û hebûna çemên sereke jê derdibin û tê re diherikin (Ferat, Dicle, herdu Zab, Diyele, Aras, ava Reş…), hêşt ku mirov û ajal lê bijîn.

Li herêmên ku av û şewq lê hene, şînahiya têvel jî şînbibe, û li wir rengên di şewqa royê de bi xwe reng têvel jî peyda bike, wê têveliya rengan bi xwe têveliya çêj peyda kir. Ji ber zimanê zindeweran li gor çêj di geya û çawîrê de çê bû, bû sedemek ku li gor çêja xwe xwerinê bixwe.

Gava yekê hêşt ku mirov ji jiyan ajalan bi dûr keve; bi karanîna agir berî şesed hezar sal bû, vê re jiyana li çolê derbas şeketan bû. Fêrî goştê sewalan bikelîne û bibirêje bû. Ev xwerina nû bû sedemek ku girseya mejî mezin bibe, bi mezinbûna wî re hiş û raman berhem da.

Loma agir li ba niştewerên Ciyayê Zegrosê payek bilind wergirt û pîroz bû, ji ber wê bawer dikirin ku rastî ji ronahiyê û êgir e, divê di malagirande herdem vêketî bimîne. Di ola zardeştiyê de kesê agir vêdixist bi agirvan nav dibû.

Ezbet û êlên bawerî bi agir dikirin, bi navê arîperst nas bûn, li wir hin bi rojhilat de berve hindê çûn, û hin jî berve Oralê çûn, hin jî bi başûr de çûm, hin jî berve rojava ta Awrupa çûn û belav bûn. Herêma zagrozê ( herêma avê) bû makdera şaristaniyê û belavbûnê ye.

Li ba Kurdan malagir û malbat beramberî hev kiribûn. Dayka malê wê agir vêdixist û jê re digotin kelfet (kelî) ji bêjeya kolpeta Hindo-Arî kişiye. Ango xwediya malê ya fermana vêxistina êgir dide.

Li ba bawermendên malagir, dibînin ku ew malagira giyanî ye jî, û şana şanazî, rûmetê û şahiyê ye.

Gava zarokekî nû bibe, piştî heft- heşt rojan dibirin di dora malagir re digerandin û navka wî dikirin malagirê, û jê re digotin ocaxzad (ocaqzad).

Gava law şo biba û ji bavê cihê biba, agir ji malagirê dibir, malagirek taybet ji xwe re vêdixist. Û gava keçê mêr bikira, diçû di dor malagirê bavê xwe re digerî û xatirê xwe jê dixwest.

Gava mar an dupişk bi yekî bidada, bi ar dişewtandin, ji ber ku şana pak û dermankirinê ye.

Ta roja îro rêçoliya «xwediyên rastiyê «, peyrewên Elî – xwedê ye baweriya xwe bi hêza cadoya êgir dikin.

Gava lavjan li mirovekî bikin dibêjin: Xwedê ocaqê te şên bike. Ango xwedê zarokan bi te de û agir di ocaqê te de vêketî bimîne, û bi şahî bijîn. Lê gava nifiran li mirovekî bikin dibêjin: Xwedê ocaqê te kûr bike. Ango tu zarok bi pê te nekevin û ocaqê te vemire û mala te dêris be.

**Serê te ... Dûmahîk**

hundir li rola xwe xwedî derkeve, rûdawên erzan mîna qelengan li ser xwe negire û bi her hawî nemaze li vê biyanistanê wê protesta bike. Dîsan biborîn, meta hêja, min serê te jî bi xwe re êşand!

# Faroq Bekir Bavê şiyar: Damezrênerê Koma Zozan li Şamê bû

**Mihemed dillî**

Ji gundê Gewrika (Kurdaxê), tev bav dê, xwîşk û biran ji zû de barkiribûn. Li taxa kurdan a Şamê bi cih bûbûn. Min ev mala welatparêz di sala 1983 yan de naskir, Faroq karmendê belavkirina postên asayşa trafîkê bû, min ji nêzîk ve dît ku ew Kurdhez û welatparêz e. Piştî 13 salan, li vê dawiyê, min kanî têkilî pêre bikra. Niha, hîn ew li şamê ye. Ji ber xebata wî ya bi fedekarî ji bo kurdan , ew ji karê fermî hatiye derxistin. Mixabin ku niha ew di rewşek zor de kar dike, da ku bi rûmet mala xwe xwedî bike.

Faroq dibêje: (Diya min digot tu di miha pala nîskan de hatiye dunyê, bavê min digot di sala 1954 de bû.

Yekemîn kesê ku ramana damezrandina komeke folklorî ya Kurdî li paytexta Sûryê - Şamê pêşniyar kirî, ew birayê mine Izzat Bekir Bavê Kawa ye (Bavê hunermend Şoreş Bekir e). Di sala 1976-an de, yekemîn car komek folklorî kurdî, li ser navê Koma Azadî hate rêkeftin. Rêvebirê koma Azadî Hanan bû û ez jî li gel Edhem, Riyad, Meimon Wanlî û Bavê Mizgîn endamên komê bûn). Her weha Farûq dibêje: (Ji ber min korsa Asaiyêşa trafikê dikir û ji ber nexweşiya herêmtiyê, min koma Azadî berda). Sala 1981 an Farûq xuya dike ku digel Jemal Eli , Hemid Horo (kinik), û Jemal Bekir , kari bûn dabeşîna komeke nu bikrana bi rêya kek Mustefa Sebrî Ednan ( paşnav nayê bîra Farûq) ew fêrî çend govendan bûn , navê ZOZAN lê kirin , wek pêşniyara Eli Jeifer bû. Rênas Hunermendekî ji bakurî Kurdisan alîkaî kir û bi hevre yekem car ahenga Newroz di sala 1981 an de Koma zozan li Xota kirin. Li daweta Sêvê Îzolî komê stran, govendên xwe pêşkêş kirin. Bi hevkarîya Koma Zozan a Helebê hevrêzî hate damezrandin û ji Hesen Koşkar fêrî hin govendan bû ( wek Qertel, Çakoç û Qalûç...). Faroqê (Bavê Şiyar ) tekez dike ku Elî Ceifer, Horan Bengî, M.Dillî, pir alîkar bûn ku endamê komê pir bibin bi tevlêbûna keç û xortina ji taxa Elqedem, û pir kes din hatin komê ji hemo herêmên kurdî yên hatine Şamê, û di nav du salan de, şaxên komê pirr bûn û xurt bûn, di civata kurdan de li şamê çalak bû, bi taybetî di Newrozê de kasêta yekem sala 1984 an derxit, Rizneme serê sala 1983 an der dixist.

Hin biroveyên xwe Komê li navenda (جبهة النضال الشعبي الفلسطيني) de dikir. Koma Zozan li şamê berdewam kir heya sala 1994 an, wê hingê bi beşin ji Koma Azadî û Welat ... komek bi navë Nohilat ava kirin bi rêveberiya Xandî û Cemal û Faroq heya sala 2000 î kar kir, û piştî Rihlekê li dervayî Şamê tev hatin girtin û komik ji hev bela bû.

Di wan salan de komin din



li şamê hebûn: Koma Mîdiya (Şukrî Terzî + ebo çençelî + Selah Bekir + Miqdad Qere Depe + Ednan Meydankî ...) Koma Kawa :1982 çêbû ( Bavê Arîn+ Mizgîn +... bi rêvbirya Rebhan ) Koma Hilat : 1982 çêbû, rêvebirê wê Ebdella Hisso bû tev Cemşîd (li Cumbuşê dixist, Remzî li Ûdê dixist, şewqî li tembûrê dixist, Mehmod Berzencî Mixabin Erşîfa Koma Zozan di bûyerên Taxa Elqedem de di va salên piştî 2011 an de bi malan re tar û mar bûn. Ev hunermendê welatparêz, dilsoz, westandî zêde dike dibêje: Tiştê ku min kiriye, ustubariyeke welatparêzî ye, da ku ez wijdanê xwe bi gelê xwe ve girêbidim. Silav, spas û rêz ji bo vî mirovê qenc re.

# Rojaneyên Efrîniyekî di bin siya dagîrkeriyê de

Osman Îso



(2)

**Dizekên xwefiroş**

Nîvro ye, dunya ji tîna rojê dikele, eger tu hêkekê dînî derve, wê biqewire. Apê Xelo xwe li hundir kiriye kêndir, ji nişke ve dengek bi pînika mirîşkan dikeve, Xelo lêhay dibe û li ser nivîna xwe rûdine.

Pîr dibêje: Xelê min rabe binêre kî ye ?

Xelo bi hêrs dibêje: Ma qey tu nizanî?! Ev bû çend car in? Dîsa ew kûçkina ne? Roviyên duling in ...

- Rabe weke her car dengekî li wan ke.

Kal li xwe zor dike û hêz xwe dike, radibe û berve pînê dere, zarokê dagîrkerekî mêze dike ew ji hêrsa re dibêje: Eger ez te careke din bibînim ezê tunê nemayî hûnim serî te û çat û bat xeberên giran dibêje!

Pîr li hundir dikene û dibêje: Kalê min, ma ew bi kurdî têdighe( fehm dike ) bi erebî bi turkî bêje.

- Kal berê xwe ber ve mala wan (ku bi darê zorê birine) dike û dibêje:

Intî yicî hon mertek cayî welle ummek .... eger tu careke din werî û hêkan bidizî, welleh billeh ezê te û malbata te û diya te ...di welwelderesiyê re derxînim! .

Pîr dikene û dibêje: Kalê min bi Xwedê Erebiya te baş e .....Bes ji bo çi tu kekeç bû ma tu newêrî gotinên nebaş bikî?.

- Qurban, ne ez newêrim ....em ne wek wan bê sinc in û bila zeng û gemarê wan di me negere ...

Gava kal bi hêrs xeberan dibêje, dayîka zarok dibhîse ...tevî ku tênegihîşt, tu tiştî lê zanî bû hêrsê kalê pir rabûye û ew bûye kizot eger kî bi ber şeplê wî keve avê lê venaxe.

Sê demjimêr derbas nabin, dîsa deng bi mirîşkan dikeve. Vê care, pîr radibe û mêzedike û nas dike bi lez vedigere û dibêje :

Kalo qurban, Xwedê ji te re şand zû zû rabe

Tu yê sûnda xwe bi cih wînî, yan sê rojiyan bigrî yan jî sê belengazan têr nan bikî.

Kal: Ew çi sûnd de Xanima min.

Pîr: Te berî vê bi zarok re çi xeber gotibûn?. Rabe dayîka wî ketiye pînê here ji heq canî wê virxûnê bi derkeve ûştê careke din kok pêle vir nekin ,û heyfa birîna zêtûnê hilîne, û bila teresê wê yê çûye Serî Kaniyê qêrîn û nalîna wê bibhîse.!

Kal bi hêz radibe û çovê xwe dibe û nav şewlerî xwe dixurîne

Pîr henekan dike û dibêj:

Kalê min xêr di te de mayî ? Û di ber xwe de dibêje em ne wiha zikreş bûn lê bû nêzî sê salan me gotina (Tu ne gur bî gurê te bixwin) baş nas kir

Kal: guhên xwe û derî bigre, bila deng bes here wa kerê, yê mal û milk birî, xelk bi zorê surgin kirî û jina xwe di pînika mirîşkên me de bi cih kirî, hele ka wa şivkê yan wa merdûmî .

Pîr: Qewat be kalo qewat be, Xwedê te bi feykirin nede, here mehîz bikute û bi hevîrî kuftake û bila bi kunxuşka û bervajkî ji vir here mal xwe .

Rojaneyên Efrîniyekî di bin siya dagîrkeriyê de

(3)

**Rengên Ken**





Kalemêr Omer Eros û hevjîna wî, di mala wan de li gundê Kûra-Efrînê, dizî jê bû

Piştî mala kalê Xelo serbinqotî hev kirin û ne zêr dîtin û ne jî pere dîtin. Dabance kire serî kalê Xelo û gotê:

Sê deqe din eger tu paran nedî me, emê te bikujîn. Mûriyekê di ser diwêr re birê diket, kalê Xel lê mêzekir û keniya, ken hêrsê dagîrker nepirçek kir û kîna wîn hilda , ew berve kalê hat û pokisek mîna riyên wî yên dirêj û genî û mişt kîn bi ser rûyên kalê yên noranî de ber da, devê kalê Xel bi xwîn bû! Bokis çiqas bi hêz bû, lê kalê Xel tenê qasî mûyekê ji cih livî û pêyên wî li kortekê vepekîn û berî bikeve destên xwe avêtin kokeke dara birandî ji koka dareke zêtûnê û mîna teyrekî baz xwe serast kir û çar tilî danehev û bi tiliya ortê ya dirêj xwîn paqij kir û bi ser ruyê wa şervanê xwefiroş de avêt û kenî. Şervanfiroş her çû har bû surgî li Rosiyê xist û qurşîn di nav lingên kalo re avêtin kalê Xel di ser milên wî re mêze kir, jina wî dît tavilê pîna mirîşkan hate bîra wî û dest avête şewler û rakir ji bo ku gemara fîşekan nebijiqê û şewler bi gemar nebe û di bin simêlan re kenî. Dagîrkerê xwe û çekfiroş dîn bûn, qurşîn şepelkûrkî avêtin qurşînek di koka dara zêtûnê re xuşî û şiqinek şikand, hîngê dilopek ji hinavê dil hilkişî çavan û barî, sê dilop di çavan de meyîn, kalê Xel bi destê rastê histêr rakir û berda birîka aliyê dil û kûr li dara zêtûnê mêze kir, çav danehev û keniya… Piştî çavên xwe vekirin, wî tu kes nedît!

# ji zimanê Kurdî pir hez dikim

Ez Bêrîvan im, keça Kurd im, yek xwendevanên NEWROZê me, ez ji zimanê Kurdî pir hez dikim, bi şanazî û payebilindî pê dixwînim û dinivisînim. Zimanê me yê şêrîn, sembol û nîşana hebûna gelê me ye, xwedîlêderketin û hembêzkirina wî jî, erk û ustûbarê me ye. Ez nav di hemû xwişk û birayên xwe yên ciwan didim, bila bi hûrbînî, van gotinên rêber û rewşenbîrê Kurd ê mezin DR.NÛREDÎN ZAZA bixwînin:

«***Gelî Kurdan!***

***Eger hun naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin, û bi hevaltî û dostaniya miletên din re bi pêş ve herin, û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin!***».



# Kesayetiya Kurd a niştimanperwe Kemal Ebdê, Ji nav me bar kir



Beyaniya roja Sêşembê 17ê Çiriya Paşîn 2020, li nexweşxaneya Efrînê, dilê xebatkarê Kurd ê navdar Kemal Ebdê rawestiya û xatir ji gelê xwe xwest. Xatir xwest û çû, lê mixabin ku wî derdê mezin, kula giran jî bi xwe re bire gorê. Li şûna ku ew berê ked û xebata xwe û hevalên xwe yên têkoşer bibîne, welatê xwe geş û gelê xwe azad bibîne, ew î derdê dagirkirina Efrîn, Serê Kamiyê û Girê Sipî jî bi xwe re bire gorê!. Li seranserî Çiyayê Kurmênc, ew kesayetiyeke civakî û siyasî naskirî bû, bêtir ji 70 salî, di ber dadmendiya vê doze de kar û xebat kiriye.

***Bila cihê te bihuşt be apê Kemal, serê malbat, xwedî û gelê Kurd xweş be!***

# Sê xweşmêrên Kurd koç bar kirin







Bi xemeke giran gelê Kurd sê navdarên xwe winda kir ku, di vê dema dawî de çûne ber dilovaniya Xwedê (Dr.Necmedîn Kerîm di 31.10.2020an de, Dr.Firset Sofî di 18.11.2020an û Îdo Baba Şêx di 29.11.2020an de). Bi koçkirina wan xebatkarên dilsoz, gelê Kurd reş girêdaye, lê ew wan comerd û lehengan jibîr nake.

***Di vê bûyera bi kul û êş de, Weşana NEWROZ serxweşiya malbatên wan û tevaya gelê Kurd dike.***

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**